Nedim Dagdeviren

Kurdî (1953 - 2007) Svenska

Nedim Dagdeviren (1953 - 2007)

Nedim Dagdeviren li Kurdistana Tirkiyeyê li Bismilê di 1953-yê de ji dayik bû. Wî xwendina xwe ya seretayî û nevendî û lîseyê li bajarê Ercîsê bi dawî anî. Piştî dîploma xwe ya ji Xwendegeha Bilind ya Mamostetiyê ya li Diyarbekirê, wî dest bi karê mamostetiyê kir. Wî di demê gêncîtiya xwe de bala xwe da ser xebata siyasî jî û ji ber xebatên xwe yên di nav KIP-DDKD-ê de ew tûşî astengî û dijwariyan bû. Nedim sala 1977-ê bi Gul xanimê, ya ku wî ji 1975-ê ve di xeabata siyasî de nas dikir, zewicî û di sala 1978-ê kurê wan yê yekê, Bawer, hat dinyayê. Nedim ji ber xebata xwe ya siyasî di 1980-ê de hat dadgeh kirin û bi deh salên hebiskirinê hat ceza kirin.

Di sala 1981-ê de, Nedim bi malbata xwe ve ji welatî derket û du salan li Sûriyeyê man. Piştre, ew hatin Swêdê û jiyana xwe ya nû li xerîbiyê dest pê kir. Tevî ku dilê wî her gav li ser bajarê Diyarbekirê bû jî, Swêd bû welatê wî yê duyê. Li vê derê kurê wî yê duyê, Robin, sala 1993-ê hat dinyayê. Nedim çend salan serkreterê Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê bû û ew ji sala 1997-ê bû endamê birêveberiya Fonda Nivîskaran ya Swêdê. Ew xwediyê weşanxaneya Mezopotamya û paşî Kurdish Publishing Centerê bû. Wî pirtûka xwe ya yekê ya helbestan *Amedim Amed* di sala 1989-ê weşand. Di sala 1993-ê de pirtûka wî ya duyê *Literature about the kurds* û di sala 2002-ê pirtûka sêyê *Den kurdiska frågan i Sveriges riksdag* ya ducildî derketin.

Nedim Dagdevirenî xewna xwe ya avakirina kitêbxaneyeka kurdî bi cih anî û di sala 1997-ê Kitêbxaneya Kurdî li Stockholmê damezirand û her ji wê salê heta 2007-ê birêveberê wê bû. Di destpêka 2007-ê de Nedim tûşî kanserê bû û di 2-ê adarê wê salê de wefat kir.

Nedim Dagdeviren (1953 - 2007)

Nedim Dagdeviren föddes i Kurdistan i Turkiet i staden Bismil 1953. Han gick sin grundskole- och gymnasieutbildning i Staden Erdis men flyttade tidigt till den urgamla staden Diyarbakir vid floden Tigris.

Efter att han fått sin lärarexamen från lärarhögskolan i Diyarbekir började han arbeta som lärare, men han engagerade sig också tidigt politiskt och fick svårigheter på grund av sin verksamhet i. i DDKD-KIP. 1975 träffade han sin blivande hustru Gül, också hon politiskt aktiv.
De gifte sig 1977 och fick sonen Bawer 1978. Nedim åtalades för sin politiska verksamhet 1980, dömdes och fick 10 års fängelsestraff.

1981 flydde han från landet och levde i två års tid i Syrien med sin familj tills de kom till Sverige. Därifrån fortsatte han sin politiska verksamhet för den kurdiska saken. Även om hans hjärta för alltid fanns i hemstaden Diyarbakir blev Sverige hans andra hemland; här föddes också andre sonen Robin 1993. Nedim var ett par år sekreterare i Kurdiska Författarförbund i Sverige och valdes 1997 till styrelseledamot i Sveriges Författarfond. Han startade förlaget Mezopotamya, senare Kurdish Publishing Center. Nedim debuterade med diktsamlingen *Amedim Amed* 1989. Hans andra bok *Literature about the kurds* kom ut 1993 och den tredje boken *Den kurdiska frågan i Sveriges riksdag* publicerades i två volymer i 2002.

Nedim Dagdeviren förverkligade sin dröm och bildade det kurdiska biblioteket i Stockholm och var dess föreståndare från 1997 till 2007. Han insjuknade i cancer i början av 2007 och sjukdomen fick ett mycket hastigt förlopp. Han avled i Stockholm den 2:a Mars 2007.